LE MONDE *diplomatique*
KURDÎ

> **çirîya paşîn 2023**

Kurd li ber man û nemanê:

# Sedsaleke din a malwêranîyê li bin banê Komara Tirkîyeyê?

Heke em rasterast werin ser pirsa xwe ya sereke: "Pirsgirêka Kurdî" di çarçoveya vê sedsalîyê de li ku dimîne? "Pirsgirêka Komarî" û "Pirsgirêka Kurdî" aşkera ye ku her ji destpêkê ji nêz ve li hev girêdayî ne û li navenda rojeva vê sedsalîyê disekinin. Em bi bîr bixin ku ji bo kurdan ev sedsal cotalî ye: Komar ne tenê sedsalîya xwe, lê Peymana Lozanê jî pîroz dike, ku her du jî ji layê civaka sivîl û partîyên kurdî bi gelek çalakîyên tên bibîranîn.

ji Adnan CELIK

Va ye sedsalîya avakirina Komara Tirkîyeyê ye. Gelek bibîranîn, konferans, pîrozbayî, bernameyên radyo û televizyonê, filmên dokumenter, podcast, hejmarên taybet ên kovaran û pirtûk, li ser çendîn babetên cuda yan derkeftin, yan jî amade dibin.

Bi min em dikarin gotûbêjên li dora vê salvegerê bikin du birên sereke: Li hêlekê, nêzîkatîya pîrozker a "romana neteweyî", ya ku komarê (ku hertim wesfa "tirk" li dû ye) wekî berhema herî mezin, herî pêşverû û serkeftî ya neteweya tirk dibîne. Li hêla din, komek helwest û nêrînên ku em dikarin wekî "bindest", "mînorîter" û rexnegir bi nav bikin. Ew Komara Tirkîyeyê berî her tiştî wekî rejîmek stemkar dibînin, ku di xêra tirk, mêr û misilmanên sunî de ye û ji bo nasnameyên din (etnîkî, dînî û zayendî) metirsî ye. Li gorî vê nêrînê, Komara Tirkîyeyê xwe di berdewamîya bilindbûna serdestîyeke sedan salan de bi cih dike, bê hed û hesab qurbanî li dû xwe hêlane û divê di her astê de bête "demokratîzekirin", wate bi temamî ji nû ve bête sazkirin û ji sifirê ve bête avakirin. (1)

Di demekê de ku alîyê yekem hemu tiştên di sedsala borî de "ji bo" komarê hatî bidestxistin, pîroz dike û dide ber pesnan, a duyê xwe di nava rejîmeke gotarî de bi cih dike ku min li derek din, bi qewlê Johann Michel (2), wekî "bîre-qurbanî" (victimo-mémoriel) bi nav kiribû. Ew trajedîyên mirovî, sîyasî û etnîkî derdixe pêş ku li ser navê komarê û "seba serê " wê rû dane.

Helwesta berevan bixwe xwe dabeş dike bo du boçûnên bîrewerî. Yek qutbûna destpêşxer derdixe pêş ku avakirina komarê rê lê vekir. Ew bi vî halî temsîla tirkbûna modern û laîk dike, li ser hêmaya hemwelatîyê ava dibe û xwe ji împeratorî û otokrasîya Osmanî cuda dike. Ya din, ku di kirasê layengirên Erdogan, AKPyê û senteza tirk-îslame de dijî, li ser berdewamîya dewrên şikodar ên împeratorîyê û ya komarê israr dike. Ew helwesta duyê, ku konservatîf, girêdayî îslamê, lê herweha mîlîtarîst û şerxwaz e jî, li ser qet nebe xalekê û ev yeke ne bê îronî ye, nêzî helwesta rexnegir dibe, ku komar bo wan tenê cilûbergek e ku netewedewleteke otorîter û tirk-raser (suprématiste turc) li xwe kirîye. Hêjayî gotinê ye ku cudahîyek çîna polîtîk-rewşenbîr û rêveberên elît ên Tirkîyeyê dabeş dike: Mîratgirên kemalîzma dîrokî bidestxistina desthilatê ji hêla "klîka AKPyê" ve wekî derbeyekê dibînin û amaje bi pêwîstîya "restorasyona komarî" dikin (wate vegerek bo renge-rêveberîyeke berî 2002yan). Ji layê xwe ve, ew rexneyê li kemalîzmê digirin bi "bêesilkirineke" oksîdentalîst a nasnameya tirkî û gilî û gazinan ji navendparêzîya wan a "jakoben" dikin. Di nava her du alîyan de, tevgera sîyasî ya kurdî dimîne di navbera ba û bagerê de. Çend nûans ne tê de û ne gelek kêm ji rastgirên tundrew –ku tenê xwe li van helwestan dikin xwedî û wan ber bi encamên dijwar ve pal didin-, layengirên van her du alîyên sîyasî û nêrînên wan

ên li ser dîrokê, li ser berzkirina tirkbûnê, ku dij-kurdîtî jê dinizile û li ser pratîkeke desthilata otorîter –ku ew qas jî lidervehêl e (excluant)- dibin yek.

Heke em rasterast werin ser pirsa xwe ya sereke: "Pirsgirêka Kurdî" di çarçoveya vê sedsalîyê de li ku dimîne? "Pirsgirêka Komarî" û "Pirsgirêka Kurdî" aşkera ye ku her ji destpêkê ji nêz ve li hev girêdayî ne û li navenda rojeva vê sedsalîyê disekinin. Em bi bîr bixin ku ji bo kurdan ev sedsal cotalî (double) ye: Komar ne tenê sedsalîya xwe, lê Peymana Lozanê jî pîroz dike, ku her du jî ji layê civaka sivîl û partîyên kurdî bi gelek çalakîyên tên bibîranîn. Bi serpereştîya HDPyê (Partîya Demokratîk a Gelan) li gelek deverên Tirkîyeyê bi sernavê "Komara Demokratik" konferans hatin lidarxistin. Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK ku navenda wê li Bûkselê ye) bi hin ji 600 delegeyên ji komên cuda yên etnîkî (akademîsyen, hiqûqnas, rewşenbîr, oldar), bi boneya salvegera îmzekirina peymanê du rojan li Lozanê li hev civîya. Her wan rojan, pankarteke duzimanî (tirkî û kurdî) ku digot, "Em kurd, Peymana Lozanê nas nakin" (3) di hevcivîneke mezin de li Amedê hatibû bilindkirin. Di wê daxuyanîyê de ku piştre hat dayîn, "sedsaleke înkar, jinavbirin û dijminahîya li ser gelê kurd" hate şermezarkirin. Weke di vexwendina konferansên HDPyê de jî derbas dibû, beşdarên van çalakîyên bîranînê piştgirîyê didin vê fikrê ku "Pirsgirêka kurdî, hindî neçareserkirî, serçaveya hemû probleman e jî [li Tirkîyeyê] û yek ji gewretirîn astengan e di pêkhatina komarê de ligel demokrasîyê" (4)

Bo hewla sentezekê li ser pirsê, em dikarin bêhnekê li dîrokê vegerin bo çavlêgêranekê.

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem piranîya kurdan, li şûna ku bikevin nava tevgereke kurdî ya serxwebûnxwaz ku hingê nû belav dibû, piştevanî dane avakirina dewleteke tirk-kurd. Helwesta elîtên kurd di dema Herba Îstiklalê de heta radeyekê bi konjunktûrê û çarçoveyên hizrî yên ber bi demên dawî yên Osmanî ve dikare bê fêmkirin: Kurdan (qet nebe yên sunî, ku para pirtir in li Tirkîyeyê û rewşa wan cuda bû ji ya kurdên elewî û êzidîyan) xwe perçeyek ji zorbeya misliman hesêb dikirin, ku li hemberî ne-misilmanan serdest û xwedan imtîyaz bûn. Bi vî awayî, propagandaya kemalîst bêyî astengîyekê karî mezinên kurdan (şêx, serekên eşîran, axa û beg …) li dora xwe kom bike. Armanca wan cot bû: Parastina Xîlafetê li hember hêze-dagirkerên xiristîyan û rêgirî ku Kurdistan ne be Ermenistan. (Pêwîst e bi bîr bînin ku berî 1915ê nêzî pişkek ji sêyan serjimara Kurdistana Osmanî ji ermenî, suryanî, keldanî û nestûrîyan pêk dihat. Peymana 1920î ya Sevrê, çawa soza serwerîyeke neteweyî bo kurdan dida, wisa jî avakirina Ermenistanekê raber dikir). Metirsî û xofa kurdan ya serwerîyeke xiristîyan bi piştevanîya hêzên Rojavayî, ya tolhildana tewanên 1915ê û îhtimala neçarbûna vegerandina mal û zevîyên talankirî yên ermenîyan, ew ber bi hevpeymanîyekê kêşan, digel kemalîstan (5), ku ev jî mentiqen li hev dihat wekî berdewamîya alikarîya bo îttihadîyan di komkujîyê de.

Lebelê, vê behsa biratîya misilman ya kurd û tirkan li ber rakirina Xilafeta Îslamî di 1924an de ji hêla Mistefa Kemal ve xwe ranegirt.

Rejîma taze ya kemalist, serkeftîya Lozanê, qewî bi netewe-dewleteke nû û bi sînorên ku Kurdistana Osmanî kirî sê beş, (Tirkîyeya Kemalîst, Iraqa mandaya Brîtanyayê û Sûrîyeya Fransyayê) xwe bi lez û bez ber bi nasyonalîzmeke tundrew a tirk ve kêşa, her ji destpeka havîna 1923ê. Hê komar nû hatibû avakirin gava ku kurdan dît ji temsîla sîyasî bêpar mane: Di duyemîn Meclisa Mezin a Neteweyî ya damezrêner de em ji 337 endaman tenê yekî kurd dibînin, ku ew di ya nîsana 1920an de 72 kes bûn. Lê dîsa jî, rakirina Xîlafetê ya ku sembola yekitîya umetê bû, qutbûna rasteqîne temam kir û çîroka tevkarîya kurd û tirk û hemû hizrên wekhevîya di navbera "birayên damezrêner" ên komarê de têk bir.

Lewra, beşeke zêde ji elîtên kurdan li hember dewletê rêya serhildanê dane ber xwe. Di serhildana 1925ê de, şêxan piranî li hember rakirina Xîlafetê insîyatif hilgirtin, yên neteweperwer li dijî îmhaya kurdan bûn. Li hêla din, hinekên din, li pişt gotinên xwe, ya rast hewl didan rêgirîyê li bezirkirina hêz û prestîja xwe ya civakî bikin ku avakirina netewedewleteke navendî û modern dibû sebebê wê bezirkirinê. Lê tiştek rast e, ew jî yekdengîya pro-kemalîst û dij-xiristîyan a salên vê demê ji bînî ve têkşikest û bû destpêka yek ji kûrtirîn û demdirêjtirîn derzên di navbera kurdan de: Ji bo, yan li dijî Komarê. Ew derza esasî wek riknekî di nava sedsalê de hûr û kûr vegerîya tiştekî din: "ji bo, yan li dijî dewleta Tirk". (6)

Wekî em dizanin, digel Serhildana Şêx Seîd ji sala 1925ê ve dewreke zordarîya dewletî û xwînrêj û tundîyeke berbelav li ser herêmên Rojhilatê destpê kir. Rêbazên rêveberîyeke seranser kolonyal, ku her 1925ê di "Plana Çaksazîya Rojhilatê"

(Şark Islahat Planı) de hatî plankirin bi gelek şêwazan dihatin pêk anîn: Bi operasyonên leşkerî û yên bêçekkirinê, bi endezyarîyên demografîk, bi dersînorkirinên armanckirî û giştî û bi dabînkirina "rejimên OHALê" ku rê dida karmend û leşkeran bi rengekî temam legal polîtîkayên dijwar ên "bişaftineke bi zorê" û êrîşên xwînrêş pêk bînin. Ya 1930ê li Agirî û ya 1936-1938ê li Dersîmê mînakên herî berbiçav in. Revandin û bicihkirina zarokên ji ber van komkujîyan mayî di malbatên leşkerên tirk û di wargehên dewletê de bo "tirkkirina" (7) wan, mixabin tenê beşeke piçûk e ji vê rabirdûya ku mora xwe li bîra kurdî daye. Lewra, em dikarin bibêjin, çaryeka yekem a qirna komarê, piştî "serkeftina hevpar" di Herba Îstiklalê de, ji 1925ê heta 1950î, bo kurdan dewreke sergêjîyê ye (gueule de bois).

Her sê derbeyên leşkerî ku dane dû hev di bîst salan de (1960,1971, û 1981), tevî cudahîyên xwe yên polîtîk ji nêrîneke "tirko-tirk", li ser xalekê xwedî yek gotinê bûn: krîmînalîzasyoneke bê navber li dijî kurdan, zimanê wan û li dijî daxwazên wan ên li dora mafên sivîl. Û ev yek gelek berî derkeftin û bilindbûna hewl û rêxistinên kurdî bû, yên xwe pêşîyê dispartin tekoşîna rêxistinî û paşê jî ya çekdarî.

Boçûna Dewleta Tirk ya pirsgirêka kurdî bi rêya zincîreyek tepeserîyan û "stigmatizasyonan" e. Vê jî xwe bi înkareke temam û berçav ya hebûna wan û bi rêze-hewlên berfireh ji bo sîvîlîzekirin, perwerdekirin û rapêçana wan xwe da der ku wan bikin hemwelatîyên resen ên tirk, lê yên "di çîna duyem" de. Hemû qiseyên li derdora pirsgirêka kurdî (her wekî demekê li dora "pirsgirêka ermenî") ji gotûbêjên ji jora dewletê hatî dirustkirin û bi şêweyekî berfireh li hemû civakê hatî belavkirin pêk tên. Ev qise, li nav welêt û li derveyî welêt, bi "politikayên taybet", bi gotinên berterefker tên rewakirin, ligel tercihên ferhengî û îdeolojîk ku li dû çarçoveya navdewletî ya her serdemekê diguherîn. Bi vî awayî, kurd (ku di demeke nêz de, ligel qedexeya binavkirina wan, dê bibûna "niştecihên Rojhilatê") salên 1920î bi "reaksîyonerîyê" sûcdar bûn, salên 1930an bi " qaçaxçîtî, salên 1940î bi "paşvemayînê ", salên 1950î bi "komûnûzme" û salên 1960 û 1970î bi "paşvemayîna civakî û aborî ", berî ku retorîka "terorîzmê" li salên 1990î li ser hemûyan ve bikeve.

Li hêla hizrên rexnegir, hejmarek çarçoveyên fikrî, sîyasî û dadwerî hatin pêşnîyarkirin bo binavkirina "birêvebirina" pirsgirêka kurdî ji hêla Komara Tirkîyeyê di sedsala borî de. Komkujî, mêtinkarî, apartayd, zimankujî, nijadkujî, bişaftina bi zorê... Yên tevgera kurdî ya azadîyê bê dudilî navê rejîma "faşîst" lê dikin. Her çi be, çar esasên sazker û xwedubareker, politikayên komarî yên hember pêkhateyên li derveyî "peymana tirkbûnê" dîyar dikin. Tundutûjîyên etnîkî yên hûrfikirî (ji komkujîyan bigire heya wêrankarîyên bêhed, pogrom û jenosîdan), nijadperestî (ku tevî ciherengîyên xwe binyatî ye: car ji konseptên bêhtir etnîsîst, car ji yên bêhtir dînî yên nasnameya neteweyî tê dariştin), bêcezayîyek legal ku tawanbarên -çi takekes çi sazî- sûc û tundîyên li ser navê neteweyê hatî kirin diparêze û ya dawî, înkareke hişk ya wan sûc û tawanan e. Bi vî rengî, ji rûdana rasteqîne ya avabûna Komara Tirkîyeyê ku, ermenan pêk anî, li dû hev her hikûmetên tirk politikayên înkarker ên êrişker xistin merîyêtê li dora hemû sûcên dewletê. Ew ji layê temamê çîna rêveber ya tirk ve hatin meşrûkirin, tevî cudahîyên wan ên navmalî li ser "sirûşta rasteqîne ya nasnameya neteweyî". Cihê serincê ye balê bikişin ser veguherînek temam ya Komara Tirkîyeyê li hember kurdan. Hesibandî wek hevkarên elzem di dema avabûnê û di kontekstekê de ku kemalîst, piştî têkçûna pan-tûranîsma îrredentîzt ya kadroyên Ittihad û Tereqqîyê, li kuncekî Anatolîyayê asê bûbûn, niha êdî ew rasterast wekî astengek dihatin dîtin ku pêwîst bû bên jêbirin. Irredentîzma taze ya neo-osmanî û tirko-îslamist ya rejîma niha, ku xeyalên vegerekê dike bo împeratorîyê (yeke heya Sûrîye, Iraq, Libya û Azerbaycanê berfireh dibe) kurd ji halê dijminên sîyasî yên ji rêzê û li navmalê veguhertin bo dijminên "jeopolîtîk". (8)

Bi vî rengî ye ku êdî mîlîtarîzma şerxwaz ya Tirkîyeyê li nav axa kurdan li welatên cînar bi fermî dirêj dibe (ji deheya 1990ê ve li Iraqê û ji destpêka şerê navxweyî li sala 2011ê li Sûrîyeyê). Di nav çarçoveya vê sîyasetê de, helbet hêza tirk çend jê tê ew hind nakokîyên navxweyî yên kurdan û yên di navbera wan û gelên din de zexmtir dike. Taybetî jî bi sistematîzekirina ferq û cudahîyan (car li ser bingehên etnîk, car mezhebî, car sîyasî, lê bêhtir jî her sê bi hev re). Derzên navxweyî yên kurdan, çi li nava Tirkîyeyê bin çi li derveyî sînoran, di xêra paramîlîtarîzasyon û hovbûneke kûr de hatin geşkirin û enstrûmentalîzekirin. Ev jî bi rê û rêbazên curbecur ên piştgirtina elîtên kurdan li hember hev hate bihêzkirin (wisa ku carinan bi bikaranîna endamên ji rêzên nizimtirîn ên civakê).

Lê ew korteja sedsalî ya şer û wêranîyan wisa xuya ye gihişte encameke berevajî ya dihate hêvîkirin: Beşek mezin ji kurdan evro ji kal û pîrên xwe yên sedeya borî gelek bêhtir di bandora nasnameya xwe ya kurdî de ne. Wêdetir, fêrbûna "statûya mînorîter" bi xwîn û goştê xwe, bû sedem ku ew bi kategorîyên din ên ku ji hêla rejîma komarparêz ve tên

tepisandin û stigmatîzekirin, hevalbendîyan pek bînin, heta vê hindê ku ji destpêka sedsala XXIê ve, ew bûne deng û berdevkên pirçandîyê, femînîzmê û heta li ba yên herî pêşverû, yên "mînorîteyên zayendî" yên civaka LGBTIA+. (9) Ya rastî û tevî bedela însanî ya bêhed giran a van helwestane, şîyana tevgera pro-kurd ya rêxistinkirinê, çi sivîl çi jî leşkerî, evro pir pêşkeftîtir e ji sed sal berê. Digel van çavdêrîyan, em dikarin wekî encam û destpêkekê, pirseke bingehîn û dijwar rasterast bipirsin: Di çarçoveya sedsalîya Tirkîyeyê de, li dû wê rastîyê ku bi gotineke berbelav a kurdî "sedsaleke nifînê" ye ku encama tevkarîya bab û kalan e di sûcê 1915ê de (10) , (û heke em rewşa heyî li ber çav bigirin, ne dûrî aqilan e ku "sedsaleke nû ya nifînê" jî li dû xwe bîne), heta çi radeyê "pirsgirêka kurdî" pirseke "serxwebûnxwaz" e? Arezûya Kurdistaneke serbixwe û azad zindî ye û berdewam dikeve nava xeyalên gelek endamên vî gelê bêdewlet, çi ew li ser axa Kurdistana dîrokî bijîn, ku evro di navbera Tirkîye, Iran, Iraq û Sûrîyeyê da perçekirî ye, çi jî li dîyasporayê, ku hejmara wan her diçe lê zêde dibe. Lê konjunktûra heyî ya jeopolîtîk li layekî, (ku sala 2023ê, tevî pêşveçûneke bêguman di hayjêbûna navdewletî de bo doz û tekoşîna wan, ne gelek zêdetir li pişta kurdan e ji sala 1923ê), li layê din herweha encamên sîyasî -û rexneyên li dû vê- ji tecrûbeya sedsalekê li dora forma rêveberîya netewedewletî, rengekî ûtopîk an jî xeyalî dide vê hesretê. Ji ber vê yekê, doza rizgarî û wekhevîyê li Tirkîyeyê, hêsantir dikeve rengê daxwazên ku bicihanîna wan, bi şêweyê teorîk, di nava sînorên heyî de pêkan e. Heke bi gotineke din bibêjin, kurd, belê statûyekê dixwazin ku hebûna wan wekî gelekî bi awayê sîyasî û qanûnî garantî bike. Zor kes dê bi van qayîl bibin: nasîneke makezagonî û efektîf, garantîyeke mafên wekhev di bin rejîmeke hemwelatîya komarî, xweserîyeke qismî, mafê dîyarkirina çarenûsa xwe û xwerêvebirina asta herêmî, heke tenê rêz li encamên hilbijartinan jî bê girtin. Ji bo wan, bidestxistina statûyekê pirsa man û nemanê ye.

Li Tirkîyeyê bişaftin û entegrasyona kurdan zor bêhtir karîger û kûrtir bû ji ya li dewletên cînarên wê. Jihevveqetandinên mekanî û çandî di navbera kurd û ereban de (li Iraqê) an jî ji farisan (li Iranê), dike ku kurdên li wan dewletan bêhtir xwe li asoya serxwebûnxwaz girê bidin. Daneyên şênber li ber destê me nîn in ku em vê çavdêrîyê piştrast bikin lê encama referanduma ji bo serxwebûna Kurdistana Iraqê (ji sedî 93 belê) nîşaneya vê yekê ye. Ne teqez e ku referandumeke bi vî rengî wê li Tirkîyeyê ji sedî 50yê dengan jî bi dest bixe û ev jî yek ji wan sedeman e ku siberoja komarê ji nêz ve bi çarenûsa kurdan ve girêdayî bimîne.

Berxwedana kurdan li vî welatî rojane dikeve formên bêhejmar di warên cihereng de û digel çend rêbazên din, di tekoşîna demokratîzekirina rasteqîne ya komarê (hindek peyva "radîkal" jî lê zêde dikin) de teşe digire, ku ev yek dibe rê veke li ber pêkvejîyaneke hêjayî navê xwe. Çi li gor şertên realpolîtîkê be, çi jî berhema nirxên nû yên dirêjîya sedsaleke tekoşînê be, ev demokratîzekirina rejîmê mixabin carinan ji îhtimala Kurdistaneke serbixwe hîn xapînertir xuya dike. Lewre, çi ji ber xema man û nemanê, çi ji berjewendîyên xwe an jî ji îdelojîyê be, yên ku naxwazin ne li ber ba û ne jî li ber bagera bi destên hesinî yên dewleta tirk a otorîter ("tirko-laîk" an jî "tirko-misilman") bimînin, di nava van keser/arezûyan de vedihejin û dudilîyek mezin dijîn. Li gor encamên guherînên hevsengîya hêzê, lê herweha li gor rewşa wan a objektîf û sûbjektîf di aborîya madî û manewî ya civaka kurdî de û her li dû van derz û cudahîyên etnîk, dînî, çînî, mekanî, nifşî û zayendî, çi bi vî layî ve biçe, çi bo layekî din, her kurdek di kûrahîya nava dilê xwe de hebûna vê pirs û lêgerîne dijî.

*Antropolog, EHESS

Adnan CELIK

*Ji fransî: Adnan Kegî*

---

(1) Pirtûkeke bijare ku bi amadekarîya komeke akademîsyenên ciwan û bi beşdarîya 100 nivîskaran (ku yek jê ez im) bi 100 gotarên xwe dê di demek nêz de bi navê Kurd û Komar ("Kürtler ve Cumhurîyet") derkeve. Ev pirtûk li ser çavkanîyên cihêreng û alîyên cuda yên vê helwestê kûr dibe, ku ji layê kurdên li Tirkîye û dîyasporayê bi awayekî berbelav tête pejirandin. Bnr. Cumhurîyet ve Kürtler, (ed.) Ayhan Işık, Gülay Kılıçaslan, Behzat Hiroğlu, Kübra Sağır û Çağrı Kurt, (Enqere : Dipnot, 2023).

(2) Johann Michel, Gouverner les mémoires - Les politiques mémorielles en France (Paris: Presses Universitaires de France - PUF, 2010).

(3) Binêr: https://bianet.org/haber/dîyarbakir-da-lozan-aciklamasi-ozgurlugun-anahtari-ulusal-birlik-281903 [https://bianet.org/haber/dîyarbakir-da-lozan-aciklamasi-ozgurlugun-anahtari-ulusal-birlik-281903]

(4) Binêr: https://www.agos.com.tr/tr/yazi/28119/hdp-den-demokratik-cumhurîyet-konferansi [https://www.agos.com.tr/tr/yazi/28119/hdp-den-demokratik-cumhurîyet-konferansi]

(5) Hamit Bozarslan, La question kurde: Etats et minorités au Moyen-Orient (Presses de Sciences Po, 1997).

(6) Adnan Çelik, Dans l'ombre de l'etat: Kurdes contre Kurdes. Une anthropologie historique des conflits intra-kurdes au Kurdistan de Turquie, yekem edîsyon, Miroir de l'orient musulman (Brepols Publishers, 2022).

(7) Zeynep Türkyılmaz, "Maternal Colonialism and Turkish Woman's Burden in Dersim: Educating the "Mountain Flowers" of Dersim", Journal of Women's History 28, hejmar 3 (2016): 162-86.

(8) Mesut Yegen, "Ethnopolitics to geopolitics: the Turkish State and the Kurdish question since 2015", British Journal of Middle Eastern Studies 50, hejmar 4 (2023): 943-61.

(9) Birgul Kutan & Adnan Çelik, Prefiguring Post-National Futures: The case of the Peoples' Democratic Congress (HDK), Turkey. ESRC Grant No: ES/R00403X/1. Brighton: University of Sussex, 2021. https://knowledge4struggle.org/ [https://knowledge4struggle.org/]

(10) Adnan Çelik û Namık Kemal Dinç, La Malédiction - Le génocide des Arméniens dans la mémoire des Kurdes de Dîyarbekir, werger: Ali Terzioglu et Jacolyne Burkmann (Paris: Harmattan, 2021).